Dê û bav/çavdêr

Bûyera trawmatîk a di dema dawî çêbûne, dibe ku yekser an jî neyekser bandor li xwendekarên li dibistana me kiribe. Fikrên me bi hemû malbat û hevalên ku ji vê bûyera trajîk bandor bûne re ye.

Îro û di hefteyên pêş de, dibe ku hûn û zarok/zarokên we bi awayên cuda bandor bibin, ji ber ku her kes dê bertekên cuda nîşan bide. Dibe ku hinek pir hestewar bibin, dibe ku hinek bixwazin biaxivin, heke hinên din nexwazin. Bertek bi demê re dikarin biguherin, ev jî bersiveke normal e ji bo bûyereke wiha. Ez we teşwîq dikim ku zarok/zarokên we bizanin ku hûn li wê derê ne ku kengî bixwazin wan parve bikin fikarên wan guhdar bikin.

Du peyamên girîng ji bo pêşvebirina zarok û ciwanan ev in:

- Gava em xwe kêm hîs dikin an jî bêhal in, divê em hemû ji kesên din alîkarî bixwazin.
- Eger hûn ji hevalekî xwe an jî ji bo xwe bi fikar bin, girîng e ku mirov ji mezinekî bawermend re bibêje.

Ji bo agahîyên zêdetir, ji kerema xwe belavoka pêvekirî ya bi navê ‘Alîkariya zarok û ciwanên di bin bûyerên trawmatîk bûne biser kevin’ bibînin. Heger pêdivî çêbibe, em we teşwîq dikin ku hûn xwe bigihînin xizmetên ku hatine lîstekirin.

Ji bo desteka zêdetir a ku li dibistana me dikare were kirin, ji xebatkarên şêwirmendiya dibistanê jî di nav da, vebijêrkên cuda hene. Ji kerema xwe, ji bo ku hûn ji bo zarokê xwe zêdetir alîkarîyê bixwazin, ji kerema xwe bi gerînendeyê zarokê xwe ra bikevin têkilîyê, heke ev hewce be.

Heke pêdivîya we bi alîkarîya wergêran hebe ji bo ku hûn bi dibistanê ra bikevin têkiliyê, ji kerema xwe li 131 450 bigerin, ji operatoran re bibêjin bê ka pêdivîya we bi kîjan zimanî heye û ji wan bixwaze ku telefonî dibistanê bikin. Ji bo alîkarîya we ya ji bo axaftina we, operator dê wergêrekî li ser xetê bistîne. Ji bo vê servîsê tu dê heqê we neyê standin.

Li gel rêzê

Mûdîr